Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1101 | 20-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Sira ‘mirovên kulîlkan’ a Zagrosan

**Li ser polenên li gora 75 hezar salî ya li şikefta Şenader a Zagrosan hatin dîtin, şîroveyeke welê hate kirin ku Neanderthalan miriyên xwe bi kulîlkan vedişartin. Li hemberî vê şîroveyê, tezeke cuda hate kirin.**

Şikefta Şenaber li nava rêze çiyayên Zagrosan li herêma Bradostê ye, cihekî xwezayî ye ku tenê bi 800 metreyî dûrî Çemê Zê ye. Li şikeftê ku sala 1951’ê ji aiyê Antropolog ê DYE’yê Ralph Soleckî ve hate keşifkirin, hestiyên Neanderthalan lê hatibûn dîtin, vî karî wê demê deng vedabû.

Lê belê ya ku Şenader li qada navneteweyî navdar kir, bermahiyên polenan bû ku li cihê ku hestiyê navê Şenader 4 lê hatiye kirin, lê hatibû veşartin. Ev bermahî bûbû sedem ku lêkolîner şîroveyeke welê bikin ku gotibûn Neanderthalan miriyên xwe bi kulîlkan vedişartin. polenan ne ji ber kulîlkan lê belê ji ber kewara mêşên hingiv bû.

Mînakên ji xaka bin û ser gorê destpêkê sala 1975’an ji aliyê du palînolog (pisporên polenan) ve hatin lêkolîn û hate tespîtkirin ku ên pênc cûreyên nebatan, her wiha yên du cûreyên nebatan ên nekarîn bêne pênasekirin e.

Hûnt û tîma wî şîroveya ku dibêje ‘Neandertalan ji bo diyarî miriyên xwe bikin kulîlk kom dikirin’ kirin mijara nîqaşê.

### Mêşên ku li binê axê ji xwe re hêlîn çêdikirin

Hûnt û tîma wî di dema kolandina sala 2016’an de pê hesiyan ku li nêzî şikeftê du kewarên berê yên ji heriyê hene. Li gorî tîma lêkolînê, mêşên ku li binê erdê hêlîn ji xwe re çêkirin, erd kolan û dibe ku dema ji kewara xwe derbas dibûn polenên kom dikirin, dane hev.



### Şenader bi ‘gorên kulîlkan’ navdar bû

Fikrê ‘dinyayek piştî mirinê’ şêweyekî fikrî ye ku mirovan û zindiyên din bi rengekî dramatîk ji hev cuda dike. Li gel ti zindiyên mîna mirovan jî fikrekî bi vî rengî yan jî rîtueleke têkildarî miriyan nehate dîtin. Lewma Şenader demeke dirêj li nava cîhana zanistiyê bû mijara nîqaşê.

### Dibe ku mêşên hingiv polen biribin

Di lêkolîneke nû de ku 28’ê Tebaxê li kovara Joûrnal of Archaeologîcal Scîence de hate weşandin, ji Zanîngeha John Moores a li bajarê Lîverpool ê Îngilistanê paleoekolog Chrîs Hûnt û tîma wî bermahiyên polen ên li Şenader 4’an jinûve lêkolîn kir û diyar kirin ku zêdebûna

### Neandertalan miriyên xwe bi deviyên bi histirî diparastin

Ji laboratûwara lêkolîna arkeolojî ya hawirdorê û Palînolojî (PEARL) angîe Perotî diyar kir ku tespîta Hûnt û tîma wê ya bi belavkirina polenan a ji aliyê mêşan ve ‘argûmaneke ku dikare qanih bike’. Hûnt tevî ku bi lêkolîna tîma xwe hevdana polenan a li Şenaderê kir mijara nîqaşê jî, anî ziman ku Neandertalan miriyên xwe bi deviyan dinixumandin ku di vê mijarê de hin delîl hene. Tîma lêkolînê hin mînakên li şikeftê kom kir û li ser vê yekê wê lêkolînê bike.

Hûnt diyar kir ku li gorî wî, Neandertalan gulî yan jî deviyên hin nebatan danîne ser cesedan, her wiha cesed bi deviyên Centaûrea solstîtîalîs nixumandin, bi vî rengî cesed ji heywanan diparastin.

# Koma Saz û Awaz û stranên şoreşgerî

**Koma Saz û Awaz stranên şoreşgerî pêşkêş dikin. Endamên komê diyar dikin ku bi stranên xwe li dijî şerê taybet û bandora wê li ser ciwanan tekoşînê dikin.**



Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê komên hunerê hewl didin bi rêya parastina çanda resen a civakan û hunera şoreşgerî peyama Şoreşa 19’ê Tîrmehê bigihînin cîhanê. Koma Saz û Awaz jî bi rêya stranên gelêrî û şoreşgerî hewl didin peyama hunerê bigihînin civaka xwe. Koma Saz û Awaz di 2021’an de li Navenda Çand û Hunerê ya li taxa Qidûrbeg a Qamişloyê hate damezirandin. Kom ji 12 ciwanên heman taxê pêk tên. Berhemên xwe di Newroz, mîhrîcan û çalakiyên hunerî û çandî ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de pêşkêş dikin. Komê heta niha 35 stranên gelêrî û şoreşgerî pêşkêş kirine. Endama Koma Saz û Awaz Nûpelda Hisên got armanc ji damezirandina komê parastina çanda civakê ye.

Nûpelda wiha axivî: “Dijmin bi rêya şerê taybet hewl dide mejiyê ciwanan bandor bike û wan ji çanda wan dûr bixin. Ji lew re em bang li tevahî ciwanan dikin ku çanda xwe biparêzin û ji bo şikandina van êrişan kar û xebata hunerî bilind pêşbêxin.”

Ji rêveberên Navenda Çand û Hunerê ya Qidûrbeg Ridwan Dêrikî jî li ser mijarê got: “Endamên komê di salên şoreşê de kom bûn û şahidên berxwedan û serkeftinê silav kirin û bîranîn.”

Dêrikî wiha pê de çû: “Gotinên van stranan rastiya şoreşê nîşan didin. Ez gotin û awazên stranan çêdikim. Naveroka wan li ser Rêber Abdullah Ocalan û şehîdan an jî li ser berxwedana gerîla li çiyayên Kurdistanê ye.”

Dêrikî wiha anî ziman:”Stranên şoreşgerî di bilindkirina morala gel de xwedî girîngiyeke mezin in. Ev stran piştgiriya berxwedana gerîlayan in destanên lehengane li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker dinivîsin.”

Dêrikî wiha dawî li gotina xwe anî: “Rêber Abdullah Ocalan dibêje ‘Me bi ciwanî dest pê kir, em ê bi ciwanan bi ser bikevin’. Ji lew re em bang li ciwanan dikin li hember êrişên şerê taybet xwe biparêzin. Deriyên me ji bo pêşwazîkirina ciwanan û perwerdekirina wan vekirî ne.”

### Sudoku: Bersiv 12

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 3 | 2 | 8 | 5 | 9 | 4 | 1 | 7 |
| 5 | 4 | 9 | 1 | 2 | 7 | 8 | 3 | 6 |
| 1 | 7 | 8 | 4 | 6 | 3 | 5 | 2 | 9 |
| 2 | 6 | 4 | 9 | 7 | 5 | 3 | 8 | 1 |
| 7 | 8 | 1 | 6 | 3 | 4 | 9 | 5 | 2 |
| 3 | 9 | 5 | 2 | 8 | 1 | 7 | 6 | 4 |
| 8 | 1 | 3 | 7 | 4 | 6 | 2 | 9 | 5 |
| 4 | 2 | 6 | 5 | 9 | 8 | 1 | 7 | 3 |
| 9 | 5 | 7 | 3 | 1 | 2 | 6 | 4 | 8 |

### Sudoku:Pirs 13

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 6 | 4 | 8 | 9 | 3 | | |
| | | | | | | 1 | | |
| | 2 | 3 | 6 | | | | | 7 |
| | 9 | 2 | | | | | 6 | |
| 8 | 1 | | | 3 | | | 7 | 9 |
| | 5 | | | | | 4 | 8 | |
| 9 | | | | | 8 | 7 | 1 | |
| | | 1 | | | | | | |
| | | 8 | 1 | 7 | 5 | 9 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Çavê te bixwim:**
- Her bijî; her hebî; aferim.

**Da bin çengên wî:**
- Pesnê wî da; germ kir; serê wî mezin kir; sîr da; binçeng lê werimandin.

**Da bin çengan:**
- Bi heman wateyê.

**Da bin kevşa:**
- Bi heman wateyê.

**Derew li biyaniyê, pesin li pîriyê:**
- Bi heman wateyê.

Destpêkê ez hinge te lê hatime, pişt re hinge xwe lê hatime.
- Ez ji te zanatir im.

**Destê wî pîroz e:**
- Çi karî dike encameke baş dide.

**Destê wî lê hat:**
- Hatina wî bikêr bû; hatina wî bisûd bû.

**Destê xwe li pişta wî xist:**
- Jê re xweş kir; germ kir; ji xwe re bi kar anî.

Dibeicim; ce dibêje ez birinc im.
- Dema di civatan de kesên beredayî pesnê xwe didin hingê tê gotin.

Dîzikê got, ez zêrîn im, heskê got, ez **li binê te geriyame:**
- Ez te pir baş nas dikim.

**Dîzikê got, ez zêrîn im, heskê got, ma ez ji kû têm:**
- Bi heman wateyê.

**Eger tu mêr bî rojên cengê pir in:**
- Kesên pesnê xwe didin ji bo wan tê gotin.

**Eger were cenga min wê bibîne benga min:**
- Pesnê hêza xwe dide.

**Emê bejna te bibînin:**
- Emê te bibînin; pêwîst nake tu pesnê xwe bidi, wê pirêzeya te xuya bike.

**Emê te bibînin:**
- Bi heman wateyê.

**Emê te jî bibînin:**
- Bi heman wateyê.

**Emê guhdarî te bikin:**
- Bi heman wateyê.

Emê qûna reş û spî li meydanê bibînin
- Wisa pesnê xwe nede, emê pişt re hev bibînin.

**Em dizên qulekê ne:**
- Em hev nas dikin; pêwîst nake em pesnê xwe bidin.

**Ew bifire jî bizin e:**
- Dema mirovek pesnê tişketî xwe pir dide, hingê jê re tê gotin.

**Ez ne ji cihekî kêm im:**
- Ez xwedîmirov û xwedîêl im.

**Ez nagihim toza wî:**
- Ez weke wî ne jîr û jêhatî me.

**Ez nahêlim ba di ber re here:**
- Ezê pir saxlem çêkim.

**Ez rim im, naçim têrê:**
- Ez ne mirovekî piçûk im; ti kes nikare gotinan ji min re bêje.

**Ezê bêm diyarê te:**
- Bi heman wateyê.

**Her rûspiyî weke kalê xwe nebîne:**
- Dibe ku te bi kesin din karîbe lê ez ne weke her kesî me.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Dakevin qadan û bi xurtî li ber xiyanetê rabin’



KCK’ê destnîşan kir ku dewleta Tirk konsepta qirkirina Kurdan dispêre xiyanetê û got, “Yekane rêya têkbirina vê konseptê jî rawestandina xiyanetê ye.” KCK’ê bang li her kesî kir ku li welat û derveyî welat dakevin qadan û bi xurtî li ber xiyanetê rabin.**R-3**

## ‘Rêgezên neteweya demokratîk serkeftina li Dêrazorê bi dest xist’



Eşye Hiso destnîşan kir ku rêgezên neteweya demokratîk li hember komployên li dijî Dêrazorê, serkeftin pêk anîn. Her wiha diyar kir ku rizgarkirina herêmên dagirkirî, daxwaza gel e û erka her kesî ye.**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1101 | 20-Îlon- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# PYD’Ê PARTIYA SIBEROJÊ Û YEKRÊZIYA KURDÎ YE

Hevserokê PYD’ê Salih Muslim destnîşan kir ku: Heta gel were rêxistinkirin û heta statuya xwe bistîne wê tekoşîn berdewam be. Di siberojê de dibe ku erkê ku dikeve ser milê PYD’ê girantir bibin. Dibe ku gelek astangî derkevin holê, lê ji bona gihiştina serkeftinê wê tu tişt ji bona me nebe asteng.**R-5**



- Salih Mislim ji bona yekrêziya Kurdî jî got: PYD’ê ji destpêkê ve û di milê hişmendî û bîrdozî ve, ne mîna partiyên Kurdistanî yên din dihizire.
- PYD’ê herdem di nava hewldanan de ye ku bi partiyên Kurdî yên mîna PDK û YNK’ê jî di nava têkiliyan de be.
- Herweha PYD’ê di xebatên Kongreya Netewî de jî cihê xwe di nava hemû komcivîn û xebatan de bi rengekî çalak girtiye.
- Salih Mislim bal kişand ser tekoşîn û xebata bi salên dirêj ya partiya PYD’ê û bedelên giran buha yên ku ji bona vê tekoşîna azadiyê hatine dayîn. Di serî de şehîdên ku partî avakirin û di asta pêşengtiyê de cihê xwe girtin, mîna rêveberiya partiyê şehîd (Şîlan Kobanê) û hevrêyên wê (Cemîl, Zekeriya, Ciwan , Fûad) û bi sedan şehîdên ku tovê partiyê avêtin û pêşengtî di hemû warî de kirin.

## Ji bo zarokên paşerojê pirojeyên taybet



Êrişên domdar yên li ser herêma Şehbayê û bi taybetî di rewşa koçberiyê de, herî zêde bandorê li zarokan dike. Berpirsa Komîteya Şilêr li herêma Şehbayê Bedîaa Mislim anî ziman ku ji bo rewşa derûnî ya zarokan pirojeyên taybet têne amedekirin.**R-2**

## Rewşa demsala pembo li herêma Cizîrê



Demsala pembo ya herêma Cizîrê bi rûbereke berfireh ku dighêje 270 hezar donim ber bi dawîbûnê ve diçe. Destey Çandiniya herêma Cizîrê diyar kir ku îsal rûbereke fireh ji pembo hat çandin û ji salên derbasbûyî baştir e, lê nexweşî jê re bû astengiyeke mezin. Herwiha cotkaran ji bo destekdayîn Rêveberiya Xweser ji wan re, banga alîkariyê kirin. **R-6**

## ‘Divê li ber zêdegaviyên Tirkiyeyê bê girtin’

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê diyar kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê têkoşîna li dijî terorê asteng dike. Rêveberiya Xweser ji bo rêgirtina li ber zêdegaviyên Tirkiyeyê jî bang kir.**R-3**

## Bajarê kevnar

Tirbespî navçeyeke ji navçeyên Rojavayê Kurdistanê ye, dikeve bakurê rojhilatê parêzegeha Hisiça. Navçeya Tirbespî ji bajarê Qamişlo bi 30 km û ji bajarê Dêrikê bi 90 km dûre.**R-7**






**Dilyar Cizîrî**
Xetimîne îcar dixwazin bi xiyanetê pişta kurdan bişkînin! *R-4*

**Zekî Bedran**
Pêwîste yên dibêjin Tirkiye me guhdar nake bên naskirin *R-5*



**Farûk Sakik**
Şahidiya Apê Mûsa *R-5*

**Nehîr Pale**
Ne tenê yek Jin bi hezaran Jin derketin *R-2*

# Perwîn Yûsif: Di xebatên PYD'ê de rola jinê sereke ye

Hevseroka Ofîsa Rêxistinî a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê, Perwîn Yûsif di salvgera 20`emîn a damezrandina partiyê xwe de, soza nûkirina bi girêdana pêkanîna projeya netewa demokratîk û biratiya gelan da.

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

Di nava pergala Sûriyeyê de ango rejîma Baasê de jin di qadên pêşengtiyê de nedigirtin. Rewşa jinan her ku diçû di nava paşveçûnê de bû û tu rolên ku hebûna wê bide diyarkirin jê re nedihatin veqetandin, berovajî wê rastiya jinê winda dibû. Jin rastî tundiya mal û civakê dihat, ji bilî zagonên ku wê weke miroveke kêm jî pênase dikir û divê di bin kontrola desthilatdariya zihniyeta baviksalarî de be. Ev yek jî bi jinan didan qebûlkirin û ferzkirin. Nêrîn û biryara jinê tune bû. Bi hatina şoreşa rojavayê Kurdistanê re, êdî şoreş veguherî aliyekî din ji xeta azadiyê. Jinan kirasê koletiyê ji ser xwe avêtin. Tenê gavek jê re divî bû ku qêrîna tevahî jinan derkeve pêşberî sîstemên desthilatdar û qadên siyaset û jiyanê veguherandin qadên şoreş û têkoşînê. Jinan ji hemû deverên cîhanê xwe li dora vê şoreşê kirin xelek û êdî jin di nav de bû hevserok, leşker û siyasetmedar. Ev hemû destkeftiyên jinan bûn û heta niha em dikarin bêjin jin esasê jiyanê ye.

Derbarê salvegera damezrandina Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê û rola jinê di nava wê de hevseroka



Ofîsa Rêxistinî a PYD`ê Perwîn Yûsif ji rojnemeya me re axvî.

**'jin canê xwe ji bo vê dozê feda kirin'**

Perwîn yûsif destnîşan kir ku gavên têkoşîna jinê li hember sîstema desthilatdariyê ye û wiha got: "Di sala 2005'an de weke tevgera jinên kurd Yekitiya Star hat avakirin, esasê wê jî li ser fikrekî demokratîk bû. Di salên 1980'ê de Rêber Apo derbasî Sûriyeyê bû, rakisyoneke gelê kurd li hember sîstema Baasê hebû. Ji sala 1985'an û şûnde kurdên Rojavayê Kurdistanê fikrê azad hembêz kirin. Vê yekê hişt ku tevlibûna ji tevgera azadiyê re çê bibe û vekirinek ji bo jinê da çêkirin ku di pêşengtiya qada civakê de bibe xwedî rol û mîsyon. Êdî jin li nirxên xwe yên azadiyê digeriya, lê weke pergalê bide çêkirin û birêxistinkirin. Di sala 2003'yan de, Partiya Yekitiya Demokratîk hat avakirin. Di nav PYD'ê de weke baskê jinê, destpêka xwe rêxistinkirina jinê bû. Vê yekê hişt ku jin di Rojavayê Kurdistanê de bibe xwedî nasname û li ser jinên tevahî netewan bandor kir. Ev serkeftina jinê bû ku êdî xwedî li xwe derkeve, rûxmî ku rêjîma Baasê pir tundî bi kar danî û di encamê de hin jin canê xwe jî ji bo vê dozê feda kirin."

**'Rêgeza hevserokatiyê di sala 2012`an de hat pejirandin'**

Perwîn wiha berdewamî da axaftina xwe û got: "Partiya me bi çareseriya doza kurdî li Sûriyê ya, ku rêya pêkanîn Sûriyeke demokratîk e, bawer kir. Lewra Pirojeya Rêveberiya Xweser a Demokratîk di kongreya xwe ya sêyemîn de sala 2007`an ji xwe re wekî esas girt. Di şoreşa gelê Sûriyê de, xeta sêyemîn a ku xwe dispêre ser enerjî û derfetên gel ên xweser, hilbijart. Her wiha pişta xwe da rola ciwan û jinê ya pêşeng, da ku bi rola xwe ya dîrokî ya pêkanîna şoreşa civakî rabin. Di heman demê de, rêgeza hevserokatiyê di rêxistinkirina xwe de di kongreya 5`an di sala 2012`an de pejirand. Her wiha gel xwe bi xwe û di nav de projeya erkaxweparastinê, xwe rêxistin kir, heta ku gihişt civakeke rêxistinkirî ku dikare xwe biparêze û mezintirîn rêxisitnên terorîst ên hov û paşdemayî têk birin. Lewre civaka me bû dozeke sereke li herêmê û pêşenga civakên rûmetxwaz ên Rojhilata Navîn."

Hevseroka Ofîsa Rêxistinî a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD`ê Perwîn Yûsif di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku girêdana xwe bi pêkanîna projeya netewa demokratîk re anî ziman û wiha got: "Em wekî Partiya Yekitiya Demokratîk PYD`ê, bi hemû rêxistinên û civaka xwe li ser tiştên ku me di rêwîstiya têkoşînê ya 20 salan kiriye, pîroz dikin û di sala 21`an de jî em ê hin tiştên din bikin, ev yek jî ji bo wefedariya me bi şehîdên me re ye. Em careke din soz didin ku rêya wan bişopînin heta pêkanîna armancên wan ên di netewa demokratîk û biratiya gelan de, da ku civaka me bibe baxçeyekî dewlemend bi rengê xwe."

## Ji Pênûsa Jin

### Ne tenê yek Jin bi hezaran Jin derketin

**Nehîr Pale**

Dîroka jin a berevajî hatiye nivîsandin dibe êdî li gorî heqîqeta wê ji nûve were belge kirin. Dilxwazên azadî û wekheviyê, lêgervanên heqîqetê her hene û wê hebin.

Dewleta Îranê di êrîşên xwe yên li ser jin û serhildanên gel ji dewletên dîtir ne cûda ye. Çawa cendermeyên Tirk bi destdirêjiyê jinên Dêrsimê kuştin niha li Îranê heman rêbazî li dijî jin û ciwanan didin meşandin. Dixwazin wan bidin tirsandin, wan terbiye bikin, fêrî koletiyê bikin û her serê wan tewandî be.

Gelo dewleta Îranê û hemû dewletên koletiyê li ser gelan ferz dikin wê heyanî kengî bi kuştin, darvekirin, girtin û tecawizkirinê çavên gelan bitirsînin.

Serhildanên bi dirûşmeya Jin, Jiyan, Azadî li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê di 16`ê Îlonê 2022`an dest pê kirin û her diçe kûrtir dibe û bû malê cîhanê tevahî.

Jîna Emînî li beramberî polîsên exlaqî û sîstemên ku jinê di bin navê zagon û exlaq de difetisînin dengê xwe bilind kir û niha jî bi sedan jin rêça wê dişopîn in. Jin tu carî li beramberî sîstemên zalim serê xwe netewandiye, çiqasî êrîş dikin ku daxwaza jin a guhertinê, jiyaneke azad û wekhev biperçiqînin lê nikarîbûn. Jin parçeyek ji xwezayê ye û çawa xweza her tim xwebûna xwe diparêze, jin jî têkoşîna hebûnê dike. Sîstemên dagirker her tim li hemberî dilxwazên azadiyê û lêgervanên heqîqetê rêbazên herî qirêj didin bi kar anîn. Dîroka jin ku ji nûve tê nivîsandin şahidiya vê yekê dike.

Jin li hemberî kuştina Jîna Emînî bêdeng neman û helwestê xwe diyar kirin. Sîstemê Jîna Emînî qetilkir, jinan jî ew desmala ku kirine star û namûsa jinê ji serê xwe avêtin, şewitandin û pêlê kirin. Di serhildanan de bi dirûşmeya Jin, Jiyan, Azadî daxwaza azadiya xwe kirin, hemû bûn Jîna Emînî û daketin kolanan. Ji roja 16`ê Îlonê heyanî niha dewleta Îranê li hemberî van serhildanan di nava dek û dolaban de ye. Tenê roja salvegera şehadeta Jîna Emînî 700 kes bin çav kirin. Li gorî agahiyên Rêxistina Mafên Mirovan a Îranê dewleta Îranê 7 xwepêşandan bidarve kirin û hukmê darvekirine daye 10 kesan û niha jî 82 kes dibe ku hukmê darvekirinê li wan were birîn. Rojane jî jinên siyasetmedar, rojnamevan û serhildêr digrin, herwiha ji bo şagirtên jin bê bandor bikin li dibistanan bi sedan kes bi jehrî xistin û niha her tim balafirên şer li ser bajarên ku serhildan lê hene, digerin.

Jin li Rojhilatê Kurdistanê û Îranê gav paşve ne avêtiye, sîstema Îranê hemû rêbazên qirêj ji bo tefandina van serhildanan dan bi kar anîn lê nikarin şoreşa jinê bi dawî bikin. Roja 16`ê Îlona 2023`an gel li gelek bajarên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê dest bi giravê kirin. Li girtîgeha Evîn a Îranê 7 girtiyên jin ên siyasî ji bo piştgiriya serhildanên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê çalakî kirin û di daxuyaniya xwe de daxwaz ji raya giştî û gelên demokratîk kirin ku bibin dengê gelê Îranê û xwepêşanderan. Li Kurdistanê û Ewrûpa meş û mitîng hatin organîzekirin û li dewletên herêmî jî Tevgerên Jinan bi riya daxuyanî û nameyan desteka xwe ji serhildanên Rojhilatê Kurdistanê û Îranê re raber kirin û silav kirin. Helwest dayîn hebûna gelan diyar dike û diparêz e.

# Ji bona zarokên paşerojê pirojeyên taybet

**Zana Roj/ Şehba**

**Êrişên domdar yên li ser herêma Şehbayê û bi taybetî di rewşa koçberiyê de, herî zêde bandorê li zarokan dike. Berpirsa Komîteya Şilêr li herêma Şehbayê Bedîaa Mislim anî ziman ku ji bo rewşa derûnî ya zarokan pirojeyên taybet têne amedekirin.**

Di bin şert û mercên zehmet yên koçberiyê de li herêma Şehbayê zarokên Efrînî yên ku ji bêhna axa Efrînê hatine mehrûmkirin, ji hemû mafên xwe yên zaroktiyê bêparin. Rojane êrîşên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve tên pêk anîn, her wiha siyaseta şerê taybet û weke koçberekî ku ji welatê xwe derketiye, hemû yek ser li ser kesayet, derûnê û piskilojiya wan bandoreke mezin çêdike. Ji lewra



komîteya Şilêr li herêma Şehbayê hat avakirin û ji bo hembêzkirina tavahî zarokan bû cihê perwerdê, pêşketin û xwedîderketinê , herwiha bi hezkirineke mezin piroje û çalakiyên renge reng didin pêşxistin.

Têkildarî erk û berpirsyariya komîteya Şilêr, her wiha çalakiyên ku didin pêşxistin berpirsa Komîteya Şilêr a Efrîn û Şehba Bedîaa Mislêm ji rojnameya me re axivî.

**"xwedîderketina li zarokan erka me ye"**

Bedîaa di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku ji bo hembêzkirina zarokan û xwedîderketina li wan ev komîte hat avakirin û wiha got: "Di nava van siyasetên ku li ser herêmê tên meşandin, herwiha êrîşên rojane yên ji aliyê dagirkeriyê ve tên pêkanîn, bi awayekî mezin li ser rewşa zarokan bandorke neyênî dike û vê yekê em di civakê de bi awayekî balkêş dibînin. Avakirina komîteyekî bi vî awayî, ji bo li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêwîst bû. Ji ber giştî herêm ji 12 salan ve di bin êrîş û kiryarên dijmin re bi sala ye derbas dibe. Ji lewre li hember rewşa tavahî zarokan em xwe berpirisyar dibînin. Ji bo serwxtbûna zarokan di hemû milan de her wiha xwedîderketina li van zarokan erka me ye".

**"Armanca me em bibin cihê hêz, enerjî û pêkanîna çalakiyên zarokan"**

Bedîa anî ziman ku di demeke kin de hewil dan ku xwe bigihînin hemû zarokan û wiha got: "Li herêma Şehbayê îsal komîteya Şilêr hat avakirin. Li ser asta herêmê xwe birêxistin kir, derbasî meclîs û komînan jî bû. Di van demên dawiyê de em hewil didin bêtir xwe di nava kampan de bi rêxistin bikin. Derveyî nevenda giştî yek navend li kampa serdem hat vekirin û di demên pêş de wê di tavahî kampan de bê avakirin. armanca me em bibin wargeheke ya xwedîderketina li hêz, enerjî û çalakiyên ku dixwazin pêk bînin".



**"Armanca me Pêşxistina çalakiyên bi bandore"**

Girêdayî çalakî û pirojeyên perwerdê yên ku ji bo zarokan hatine pêşxistin bedîa wiha axaftina xwe domand: "Bi taybet piştî erdheja ku hatiye rûdan bandoreke mezin di aliyê piskilojîk de da avakirin. Li hember vê yekê me dest bi çalakiyên cuda yên hunerî, çandî, sporî, perwerde, leystok û hwd me kir. Niha di hundir navendê de waneyên fêrkirina çêkirina wêneyan tê dayîn, her wiha leystoka bîng bong tê fêr kirin. Di heman demê de di aliyê perwerdeyên fikrî yên girydayî çand û exalaqê civaka me de perwerde tên dayîn. Girêdayî 4 ê Nîsanê zarokan dest bi çandina daran kir. Herwiha hemleya paqijkirina jîngehê hat destpêkirin da ku zarok di giringiya paqijiya derdor û civakê de serwext bibin. Di dema pêş de wê pêşxistina piroje û çalakiyên bi bandor jî hebe.



# Kar û xebatên Rêveberiya Şûnwaran ya herêma Cizîrê

Têkildarî deverên kevnar yên herêma Cizîrê, rêveberê Rêveberiya Şûnwaran da zanîn ku 35 parêzvan ji bo parastina hezar û 43'ê deverên kevnar yên ku temenê wan vedgere hezarê salan, hatine erkdarkirin. Herwiha ji bo Girê Tilhelf yê ku ji aliyê dagirkeriyê ve tê wêrankirin bang li UNESCO Kir.

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Rêvebeiya Şûnwaran ya herêma Cizîrê yek ji dezgehên ku kar û xebatên wê têkildarî parastina cihên kevnar yên herêma cizîrê ye. Ev rêveberî bi awayekî fermî bi damezrandina Rêveberiya Xweser re di sala 2014'an de hat damezrandin. Weke ku tê zanîn Sûriyê û bi taybet li Rojava Cihên dîrokî û şûnwaran pir in. Li herêma Cizîrê, bêtirî van cihan jî girên biçûk û mezin in, hejmara wan girên girêdayî Desteya Şûnwaran hezar û 43'ê gir in.

Rêveberiya Şûnewaran ji du beşan pêk tê, beşek li bajarê Qamişlo û beşeke din jî li bajarê Hesekê heye. Hejmara endamê vê desteyê bi giştî 9 in. Hejmareke wisa pir ya girên vê herêmê, tekez e ku bê parastina namîne ji bo vê yekê jî rêveberiyê 35 kesên parêzvan ji bo parastina van cihan erkdarkirin.

Girêdayî xebatên Desteya Şûnwaran û dîroka deverên kevnar rêveberê Rêveberiya Şûnwaran a herêma Cizîrê Şêxmûs Hemo ji rojnameya me re axivî.



**Kar û xebatên Rêveberiya Şûnwaran**

Şêxmûs Hemo di derbarê makanîzma karê rêveberiyê de wiha got: "Em weke Rêveberiya Şûnwaran erka me parastina cihên dîrokî û kevnar yên herêma Cizîrê ye. Ev herêm bi deverên kevnar zengîn e, ev yek jî kok û dîroka gelên wê destnîşan dike. Li herêma Cizîrê girên kevnar pir in, hejmara wan jî hezar û 43 gir in. Hejmara girên ku lêkolîn li ser wan hatine çêkirin û hatine kolandin nêzî 30'î ye. Di hundrê van giran de tiştên kevnar; weke peyker, cerên avê yên kevnar û hwd… hene. Da ku ev dever ji rewşên diziyê û avakirina bêser û ber werin parastin, me 35 parêzvan erkdar kirin, her parêzvanek bi awayekî rojane li gor hejmara girên ku jê re hatine diyarkirin, diparêze. Li aliyekî din jî hin deverên kevnar li herêma me hene ku hatine kolandin û rastî xirakirinê tên. Em jî wan deveran ji rewşa avhewayê yên weke baranê û hwd… her sal diparêzin. Di sala 2021'ê de me bi hevkariya Rêxistina Elşerq navendeke taybet ji bo şûnwaran li navçeya Rimêlan vekir. Şûnwarên ku di vê navendê de ne, hejmara wan 7 hezar û 380'ê ye û beriya Şoreşa 19'ê Tîrmehê ji hemû girên herêma Cizîrê hatine derxistin. Dema ku Rêveberiya Xweser hate damezrandin, ev şûnwar li cem xwe parastin û piştre di vê navendê de hatin komkirin."

**Cih û dîroka deverên kevnar yên herêma Cizîrê**

Hemo girêdayî cih û dîroka deverên kevnar wiha anî ser ziman: "Li herêma Cizîrê gelek cihên kevnar ku dîroka wan vedgere hezarên salan, hene. Her devereke ku hatiye kolandin û lêkolîn di derbarê de hatine çêkirin xwedî dîrokeke kevn e. Nexasim Girê Tilhelef ya ku vedgere serdema neolotîk û dîroka wî nêzî 6 hezar berî zayînê ye. Ev gir cara yekê di sala 1911'an ji aliyê şûnwarnasê Elmanî Maks Fon Opin Hayîm û hikumeta şamê ya wê serdemê de, bi awayekî berfireh hat lêkolînkirin. Herwiha heta niha 4 caran lêkolînên şûnwariyê li ser hatiye çêkirin, ya herî dawî jî di sala 2006'an de bû. Wekî din jî Girê Moza jî di heman rewşê de ye, ku dîroka wê jî gelekî kevnar e. Ev dever vedgere serdema şaristaniya Hûrî û di nav xwe de jî perestgehekê jî vedihewîne. Hêjayî gotinê ye ku li gor lêkolînên li ser hatine çêkirin, çawaniya çêkirina vê perstgehê nehatiye naskirin. Ji ber ku cureyê latên ku pê hatiye çêkirin heta niha tu kes nizane bê ev lat ji kû hatine û çawa li ser hev hatine lêkrin."

**Astengî**



Şêxmûs Hemo têkildarî pirsgirêkên ku tên pêşberî kar û xebatên Rêveberiya Şûnwaran, wiha axivî: "Di nav kar û xebata rojane de gelek astengî derdikevin pêşberî me. Ji van astengiyan jî hejmara parêzvanên ku parastina deverên dîrokî dikin. Ev hejmar li gor hejmara deverên herêma Cizîrê pir kêm e. Raste rojane derdikevin parstina van deveran dikin, Di heman demê de em têkiliyên xwe bi komîn û şaredariyên navçe û bajarên herêma xwe re ji bo parastina van deveran xurt dikin. Lê hin devrên din hene ku bê parastin dimînin."

**Banga ji bo deverên kevnar yên di bin dagirkeriyê de ne**

Rêberê Rêveberiya Şûnwaran Şêxmûs Hemo balkişand ser rewşa şûnewrên li deverên hatine dagirkirin û axaftina xwe wiha qedand: "Em hemû dizanin ku şûnwarên kevnar û deverên dîrokî çiqasî rastiya dîroka gelên vê herêmê dide destnîşankirin. Hertim hêzên dagirker jî cihên dîrokî dike armanc. Ev yek jî di roja îro de di derheqê girê Tilhelef de tê kirin. Dema ku dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên wê êrîşî Serêkaniyê kirin, destpêkê Tilhelef kirin armanc. Vê dagirkeriyê di derheqê Tilhelef de kiryarên bêwijdanî kir, herwiha talan û wêraneke bêsînor kir. Dewleta Tirk ya dagirker û çeteyên girêdayî wê bi awayekî rojane kiryarên kolandin, dizî û wêrankirina li Tilhelefê û deverên din yên dîrokî, dikin. Em weke Rêveberiya Şûnwaran ya herêma Cizîrê van kiryaran şermezar dikin. Herwiha ji UNESCO'ê (Rêxistina Perwerde, Zanst û Çandê ya Dewletên Yekbûyî) daxawz dikin ku kiryarên dagirkeriya Tirkiyê ji hemû cîhanê re eşkere bike. Di heman demê de destekê bide Rêveberiya Xweser da ku şûnwarên hatine dizîn vegerîne cihên wan û van deverên wisa ji kiriyarên dagirkeriyê biparêze."

# Bajarê kevnar

**Deriya Çiya/Qamişlo**

Tirbespî navçeyeke ji navçeyên Rojavayê Kurdistanê ye, dikeve bakurê rojhilatê parêzegeha Hisiça. Navçeya Tirbespî ji bajarê Qamişlo bi 30 km û ji bajarê Dêrikê bi 90 km dûre.

Tirbespî navekî kurdî ye, ji du peyvan pêk tê, tirb û spî ew jî ji du tirbên spî yên ku dikeve ser girekî di goristanekê de, li cem mizgefta Mela Ehmed. Lewra navê wê bû Tirbespî. Suryanîyan navê Qubur Elbîd lêkirin, ew jî ji ber ku her tim gorên xwe bi kilsa spî siwax dikirin. Herwiha bi navê Herêma Cerehê jî tê nasîn, ji ber ew Çemê ji bakur tê û di nav Tirbespiyê re, ji kêlhesenakê û Mizkeftê ve tê û di nava Tirbespîyê re derbas dibe. Ev cihê çem tê re derbas dibe Cereh jê re dihat gotin. Sultanê Osmanîyan navê sinceq lê kirin, ew jî navê serleşkerekî wan bû, ev yek dide xuyakirin ku ev navçe destpêkê di bin serwerîya wan de bû. Ereban jî navê Qehtanîyê lê kirin, ev nav ji malbata Qehtan hatîye. Ew jî erebê Yemenê yên ku dûrî vê navçeyê bi 2500 k.m ne.

Herweha derbarê dîroka bajarê Terbespiyê de du nêrîn hene.




Nêrîna yekê ew e ku Tirbespî bi qijla ferensiyan avabû ye, di sala 1927`an de malbata Haco Axa serokê êla Hevêrka ji serxetê tevî 600 malbatên kurd binxet bûbû, hin dibêjim çend malên suryanî û eremenî bi wan re bûn, ew jî ji eynî êlê bûn. Serleşkerê fernsiyan ew dever da wan û Tirbespî û gundên wê ava kirin.

Nêrîneke din dibêje ku di sala 1840`î de malbata Ico ew jî ji êla Dorikan li alîyê rojhilatê çem niştecih bûn. Tê gotin ku herêma sincq a Xelef Axa bû û wî alîkarî da Hesen Ico da ku Tirbespiyê ava bikin. Heya sala 1960`an ji bilî şivanekî tu kesên ereb lê nebûn. Piştî Kembera Erebî û pêkanîna pirojeya Mihemed Teleb Elhilalî guhertinên demografîk çêbûn, êdî ji Serêkanî hetanî Dêrikê 40 gund ji bo ereban hatin avakirin û gelek ereb hatin bi cih kirin, mîna erebê ( mexmûrî, cewale, Reqa û Helebê) û dest danî ser erdên kurdan û navê gundan guhertin û kirin erebî.

**Erdinîgariya Tirbespiyê**

Bajarê Tirbespiyê dikeve nîvê deşteke bi bereket de. Çemê Cerahê ku ji Turkiyê tê wê dike du beş. Bajar bi gelek bendavên embarkirinê ve hatiye dorpêç kirin, wek; Bendava Çilaxa, Bendava Mizgeft û Bendava Zexîre ku bûne sedema guhertina avhewaya herêmê û rûbera wê nêzê 872.67km².

Herwiha bajarê Terbespiyê bajarekî mezine nêzî 150`î gund girêdayê wê hene. Gelek cihên xweş ji bo geştyarîyê lê hene û bi taybet gundên alîyan mîna; Dêrna axê, Kêlhesenakê, Xuşînî, Dêrina Qulinga û...hwd.

Cihên kevneşop û dîrokî jî hene, mîna Girê Lêlan ku gundekî pir kevin û dîrokî ye,temenê wê digha 4000 sal bz. Gundê Lêlên li herêma Senceqê ye, 8 kîlomitir li bakurê bajarê Terbespî yê ye.

**Malbatên sereke li bajarê Tirbespiyê**

Mala Ezem, Mala Haco, Mala Kêlo, Mala Xaşo û Mala Çomeran. Ji hunermendên navdar ên xelkê Tirbespiyê Ciwan Haco û Xêro Ebas in. Avahîyê berê yên Tirbespîyê xanîyên axî ji kelpîçan dihatin çêkirin, kêm xaniyên ji bilokan hebûn.

Xelkên Tirbespiyê debara xwe bi çandinî, xwedîkirina sewalan û bazirgaiynê tînin û devera Tirbespiyê bi çandinî û neftê tê nas kirin. Her weha li Tirbespespiyê Asûrî, Kurd, Ereb û Êzidî bi hevre jiyan dikin.

Herwiha Bûyera herî balkêş di Tirbespî de "Lehîya Tirbespî" ew jî di dîroka 28.4. 1962`an pêk hat û di encamê de 27 kes an jiyana xwe ji dest dan û gelek zirarên madî çêbûn.

**Navê eşîrên Tirbespî yê**

**Eşîrên kurdan**

Dorikî, Hecî Silêmam, Comira, Zaxuranî, Seyîd, Hevêrkî, Hermîs, Cotika, Mehelmî, Harûnî,Dêwanî, Omerka û Basiqlî.

**Eşîrên Ereban**

Elxamrî, Elzerîf, El-Eceman, El-Beqûn, El-Şererat, El-Kisêrî.

Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re di sala 2012`an de, ev herêm wek tevahiya herêmên di bin serwerîya rêveberîya xweser de ye û tê de her sê pêkhate bi ziman, kultur û çanda xwe lê dijîn.

# Rewşa demsala pembo li herêma Cizîrê

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Demsala pembo ya herêma Cizîrê bi rûbereke berfireh ku dighêje 270 hezar donim ber bi dawîbûnê ve diçe. Destey Çandiniya herêma Cizîrê diyar kir ku îsal rûbereke fireh ji pembo hat çandin û ji salên derbasbûyî baştir e, lê nexweşî jê re bû astengiyeke mezin. Herwiha cotkaran ji bo destekdayîn Rêveberiya Xweser ji wan re, banga alîkariyê kirin.**

Pembo li herlêma Cizîrê yek ji cureyê çandiniyê yê girîng e, ev cureyê çandiyê li vê herêmê bi berhemdayînê weke genim, ceh û nîskan navdar e. Îsal jî demsala pemboo li herêma Cizîrê nêzî 270 hezar donim hatiye çandin. Di dema niha de jî ber bi dawîbûnê ve diçe û cotkar jî amadekariya xwe ji bo çinîn vî berhemî dikin.

Di derbarê rewşa pembo ya îsal de rêveberê Beşê Hilberîna Riwêkî Berhemdayîna Çandiniyê ya herêma Cizîrê Mitez Ehmed û cotkarê bi navê Eymen Tîşê ji rojnameya me re axivîn

### Rweşa demsala pembo ya îsal

Mitez Ehmed di destpêka axaftina xwe de bal kşand ser rewşa demsala pembo ya îsal û wiha got: “ Ger ku em li ser rewşa pembo biaxivin, divê bal li ser rewşa pembo ya sala derbasbûyî were kişandin. Weke ku em dizanin rewşa pembo di sala derbasbûyî de ji aliyê çakbûna wê ve heya astekê ji ya îsal baştirbû. Sedem ji vê yekê nexweşaiya ku ji pembo re bû weke bobelatê. Îsla li herêma me rêjeya rûberên zeviyên pembo yên ku nexweşiyê lêdaye ji ya sala derbasbûyî zêdetir e. Lê di heman demê de rêjeya rûbera ku îsal



Metez Ehmed

li vê herêma hatiye çandin ji rêjeya salên ku derbas bûn e zêdetir e. Ev nexweşî bi riya kurmekî çêdibe, her sal li herêma me ev diyarde derdikeve pêşiya zeviyên pembo. Ev yek jî bandor li rewşa pembo ya zeviyên herêma me dike. Cotkarên ku guh didan zeviyên xwe û pemboyê xwe baş derman kirin, îro rewşa wan baş e. Em ber bi dawîbûna rahiştina vî berhemî ve diçin û cotkarên me jî amadekariyên xwe ji bo vê yekê dikin.”

### Şopandina demsala pembo ji destpêka wê heta dawiyê

Têkildarî şopandina Desteya Çandiniyê ya Herêma Cizîrê ji bo demsala pembo Mitez Ehmed wiha axivî: “Em weke Desteya Çandiniyê, pilannameyeke me ya salane ji bo çandina her cureyekî çandiniyê heye. Ev yek ji bo demsala pembo jî derbasdar e. Ji destpêka ku cotkar pembo diçînin, şopandina me jê re heya ku ev berhem tê bidestxistin, heye. Ji bo pembo û şînahiyên din rêje û mercekî çandiniyê heye. Her cotkarek li gorî rûbera erdê xwe ji mafê wî ye ku ji sedî 18 li ser asta erdê xwe biçîne. Em vê yekê jî dişopînin, lê hin cotkar hene li gor vê biriyarê tevnagerin. Em weke alîkariyekê bi cotkarên xwe re dikin û baceyan li wan naxin. Wekî din jî li ser asta



Eymen Tîşê

bajar û navçeyên herêma Cizîrê jî 17 rêveberiyên desteyên çandiniyê hene. Ev rêveberî di nav xwe de beşê parastinê, çandiniyê, parêzgehan û hwd hene. Herwiha ev beş jî bênavber bi karên çandiniyê ve mijûl dibin. Di heman demê de rewşa pembo ji aliyê van beşan ve ji destpêka ku tê çandin heya tê çinîn, tê şopandin. “

### Astengî

Mitez Ehmed di derbarê astengiyên ku tên pêşberî cotkaran wiha got: “ Ji destpêka ku pembo tê çandin heya ku tê rakirin, ew rastî pirsgirêkan tê. Cotkar dema ku dest bi çandiniya pembo dike rastî zehmetiyan tê. Yek ji van zehmetiyan jî, kirîna tovê pembo bi xwe ye. Ew tovên xwe ji firoşgehên çandiniyê yên taybet bi buhayekî bilind dikirin. Wekî din jî cotkarên me astenigiyê di warê wergirtina madeya mazotê de dibînin. Mazot ji aliyê Desteya Sotemeniyê û gaziyên bijartî ve tê belavkirin. Cotkar jî her 2 heftiyan mazota xwe tînin. Lê carcaran mazot têra wan nake û neçar dimînin ku mazota serbest dikirin. Ev yek jî bandoreke neyînî li aboriya cotkaran dike. Herwiha zeviyên pembo dema ku guzikê digire rastî nexweşiyan tê. Ger cotkar zeviyên xwe neparêze wê rewşa wê di xeteriyê de be. Nexweşiya ku li pembo dide bi riya kurmekî ye. Ev kurm bi navê Kurmê Guzika Pembo yê Amerîkî tê naskirin. Herwiha dema guz bi zeviyên pembo ve berhem dide, ev kurm guza pembo qul dike û xera dike. Lewma encamên nebaş di berhemdayîna zeviyên pembo de çêdibin. “

### Çarieseriya astengiyên cotkaran

Rêveberê Beşê Hilberîna Riwêkî Berhemdayîna Çandiniyê ya herêma Cizîrê Metez Ehmed di dawiya axaftinên xwe de ji bo çareya astengiyên ku tên pêşiya wan wiha got: “ Em rewşa ku cotkarên me tê re derbas dibin, nas dikin, ji ber ku em herdem rewşa pembo ya herêma xwe dişopînin. Herwiha çi pirsgirêka kirîna tov bi buhekî bilind be, yan jî dermanên ku li pembo tên reşandin, em di ber çavan re derbas dikin. Di heman demê de astengiya ku cotkar ji ber mazota jenetorên bîrên xwe têdikêşin, heqdestê kedkarên ku bi buhayekî bilind kar dikin, wê çareser bibe. Ev yek jî bi riya bilindkirina buhayê kirîna pembo ye. Em civînên berfireh bi Yekîtiya Cotkaran, Desteya Daravî û Desteya Çandiniyê ya bakur û rojhilatê Sûriyê re li dar dixin, herwiha biriyareke guncav ji bo buhayê pembo tê diyarkirin.”

### Nerîna Cotkaran

Cotkarê bi navê Eymen Tîşê ku ji gundê Dugirê yê girêdayî navçeya Tirbespiyê ye, têkildarî rewşa pembo wiha axivî: “Ji bo rewşa pembû ya îsal li gor sala ku derbasbû piraniya zeviyên herêma me, qelsbûnek tê de heye. Sedem jî nexweşiya kurmê ku li guzê dixe ye. Piraniya cotkaran ji ber vê nexweşiyê rastî astengiya hatin û zerereke madî ya mezin gihaşte wan. Min jî ji ber vê nexweşiyê zerareke madî ya mezin dît. Min li gundê Beyandûr yê girêdayî Tirbesbiyê 20 donim pembo çandine. Herwiha min ji destpêka ku ev pembo çandiye heya niha, 14 caran zeviyê xwe av daye û hîna jî avdana me berdewam e. Birastî heya ku em pembo diçinîn û kom dikin, em gelekî ked û mesrefa madî didin. Destpêkê em tovê pembo ji firoşgehên dermanên çandiniyê yên taybet dikirin û kirîna wê jî bi dolar e. Di heman demê de dermanê ji bo parastina ji kurm yê ku em dikirin jî bi dolar e. Lewma ev yek li ser me cotkaran gelekî giran e. Li aliyekî din jî madeya mazota ku ji bo jenetorên bîran tê belavkirin têra me nake, ji ber wê em litreya mazotê ji gaziyên taybet bi hezar û 750 leyreyên sûrî dikirin.”

### Banga cotkaran

Eymen Tîşê ji bo destekdayîna Rêveberiya Xweser ji cotkaran re wiha axivî: “Ji ber ku demsala pembo li herêma me gelekî girîng e, pêwîste Rêveberiya Xweser ji wiha zêdetir destekê bide cotkaran. Destpêkê divê mazota jenetoran li gor pêdiviya me bê belavkirin û pirsgirêka kêmbûna mazotê bê çareserkirin. Herwiha divê rêveberî bi riya desteyên çandiniyê yên bakur û rojhilatê Sûriyê tov û dermanê pembo ji cotkaran re peyda bike û li cotkaran belav bike. Ji ber ku em tovên pembo pir buha dikrin û ev yek jî banoreke neyînî li me dike. Lewma em cotkar ji Rêveberiya Xweser hêvî dikin ku îsal jî weke sala derbasbû, pembo li gor dolar ji me bikre.”

# ‘Sedema bihabûna kelûpelan têkçûna nirxê lîreya Sûrî ye’

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Bazirganên bajarê Qamişlo diyar kirin ku sedema sereke ya bilindbûna buhayên kelûpelan, têkçûna nerxê lîreya Sûrî ye. Herwiha Desteya Pêjiyaniyê ya bajrê Qamişlo jî da zanîn ku şopandina bazar û firoşgehan ji aliyên wan ve berdewam e.**

Piştî derbasbûne 12`e salan di ser kirîza Sûriyê re, ji ber şer û dorpêça heyî aboriya Sûriyê ji sedî 80`ê têk çû, her wiha bihayê lereya sûrî li hember dolarê Amrîkî pir kêm bûye. Ji ber ku tevahiya kelûpel li gorî dolar tên firotin, vê yekê barê ser milê welatiyan girantir kir û welatî bi zehmetî debara jiyana xwe dikin. Li hemberî cûdahiyên di navbere buhayên kelûpelan û ji bo kontrolkirina bazirganiyê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê, Desteya Pêjiyaniyê gelek kar û xebatan dide meşandin.

Derbarê bilindbûna buhayên kelûpelan, bazirgan û Desteya Pêjiyaniyê ya bajarê Qamişlo ji rojnemeya me re axivîn.

Bazirganê kelûpelan yê bi Rodan Ehmed da zanîn ku sedema bihabûna kelûpelan, bilindbûna nirxê dolare wiha û got: “Di dema dawî de, ji ber bilindbûna mezin a nirxê dolar li hember lîreya Sûrî, her kes rastî zehmetiyan hat, mûçeyên karmendan ji bo debara jiyana welatiyan, kême. Sedema wê jî têkçûna nirxê lîreiya Sûrî ye. Herwiha sedemê bilindbûna dolar li hemberî lîreya Sûrî zerarek gihand pazirganan jî. Ev yek jî ji ber bê istqrarbûna nirxê dolare.”

Rodan di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Zêdebûna bihayan û hilweşîna nirxê lîreyê bandoreke neyînî li ser jiyan û hêza kirînê ya welatiyan kir, ev yek jî di tevgera bazarê de eşkere ye. Li aliyekî din jî, yek ji sedemên bihabûna kelûpelan, ew e ku dikandar û bazirganan, piraniya kelûpelan ji derveyî herêmê digirin.”

Rodan Ehmed di dawiya axavtina daxwaz kir ku her kes bibe alî kar bi malbatên qizab re û wiha got: “îro roj her kes ji bo debarkirina jiyana xwe zehmetî dibîne, ev jî sedema ne istiqrare dolare, roj bi roj bilind dibe. Ez bi



Rodan Ehmed

hêvîma her kes xwe berpisiyar bibîne û bibe alî kar ji malbatên qizab re.”

### ‘Kesê ku li gor zagonên pêjiyaniyê tev negere wê bê cezakirin’

Endamê Komîteya şopandinê ya desteya pêjiyanê ya bajarê Qamişlo Kîfah Sa’idûn derbarê kar û xebatê desteyê wiha got: “Em wekî komîta şopandinê, her roj li tevahiya bazar û dikanên bajêr şopandinina bûhaya kelûpelan dikin; mînak di demjimêr 3’ê sibihê de, şopandina me li nangihên otomatîk yê li bajarê Qamişlo destpê dike, li ser asasê ku em tekîz bikin, ku kar û xebat baş tên meşandin.



Kîfah Sehdûn

Di heman demê de, ji demjmêr 9’ê sibehê şopandina me li ser furiştgehan jî çêdibin, her wiha yên ku li gor zagonên pêjiyaniyê tev nagere yê tên cezakirin.”

### ‘Divê welatî jî bi me re bibin alîkar’

Endamê Komîteya şopandinê ya desteya pêjiyanê ya bajarê Qamişlo Kîfah wiha axaftina xwe bi dawî kir: “Em wekî komîteya şopandinê, hewil didin ku bi gel re bibin alîkar, lê em bi hêvîne ku welatî jî bi me re bibin alîkar, dikarin li ser firoşgeh û bazirganên ku ne li gorî biryaran tevdigerin, agahiyan bidin me. Dema ku welatiyek cudahiya



Bengîn Ehmed

di navbera dikanan de bibîne, divê giliyê fermî pêşkêşî pêjiyaniyê bike. Lê mixabin welatî ti gilî nakin. Li aliyekî din em karê xwe dikin û şopandina me rojane berdewam e, rojane nirx têne danîn û eger hemwelatiyek gilî radestî me bike, em rewşê lêkolîn dikin û eger tesbît bibe ku zagon û biryarên me hatine binpêkirin, em ceza li ser wan dikandar yan bazrganan disepînin.”

Hevserokê pêjiyaniyê li bajarê Qamişlo Bengîn Ehmed axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em bi hêvîne ku welatî bi mere bibin alî kar û çavê xwe ji kêmasiyên dikanan negirin û bêdeng nemînin. Divê her kes xwe perbisiyar bibîne.”



# KCK’ê bang kir: Dakevin qadan û bi xurtî li ber xiyanetê rabin

KCK’ê destnîşan kir ku dewleta Tirk konsepta qirkirina Kurdan dispêre xiyanetê û got, “Yekane rêya têkbirina vê konseptê jî rawestandina xiyanetê ye.” KCK’ê bang li her kesî kir ku li welat û derveyî welat dakevin qadan û bi xurtî li ber xiyanetê rabin.

**Navenda nûçeyan**

KCK’ê got, “Êdî ne bi gotinên şermok, lê belê bi rengekî xurt her kes rastiyê destnîşan bikin. Em neçar in ji xiyanetê re bibêjin xiyanet. Eger em karibin vê bikin, karibin ji xiyanetê re bibêjn xiyanet û helwestê nîşan bidin, hingî em ê karibin pêşî li ketin û felaketên mezin bigirin. Em ê bi vî rengî yekîtiya Kurdan pêk bînin. Di rewşeke berevajî de em ê rê bidin felaket û xiyanetên hîn mezin. Ev yek jî wê bibe nebaşiya herî mezin a li doza Kurd û Kurdistanê.”

Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê têkildarî êrişa çekdarî ya li ser Nûnertiya Başûrê Kurdistanê ya Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) daxuyaniyek da ku di encamê de li Hewlêrê Denîz Cevdet Bulbun hate qetilkirin.

Daxuyaniya Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK’ê ya ji bo gelê Kurd û raya giştî ya demokratîk bi vî rengî ye:

“Mîna ku raya giştî jî pê hesiya, dewleta Tirk êrişên xwe zêde kiriye. Herî dawî li Silêmaniye û Hewlêrê êriş hatin kirin. Beriya du rojan jî li Rojava û Şengalê êriş pêk hatibûn. Di encama van êrişan de şehadet çêbûbûn. Li aliyê din dewleta Tirk ji xwe li dijî tevgera me û gerîla bi rengekî bê navber êrişan dike. Gerîla li dijî van êrişên dewleta Tirk li ber xwe dide. Di şexsê kesên ku di van êrişan de hatin qetilkirin û şehîd bûn, em hemû şehîdên şoreşê û demokrasiyê bi hurmet û minetdariyeke mezin bi bîr tînin, dilsoziya xwe ya bi têkoşîn û bîranîna şehîdan dubare dikin. Gelê Kurdistanê yê welatparêz wê teqez ji dijmin û xayinên bi dijmin re tevdigerin hesabê van hemûyan bixwaze.

### Êriş ne bi hêza dijmin lê bi piştgiriya xiyanetê têne kirin

Mixabin di van êrişan hemûyan de tiliya xiyanetê heye. Ev êriş ne bi hêza dijmin lê belê bi piştgiriya xiyanetê têne kirin. Di encama van êrişên bi xiyanetê de şehadet çêdibin. Ev yek mirovan diêşîne lê belê rastî ye. Têkiliyên Barzaniyan ên bi dewleta Tirk re xiyaneteke eşkere ye û ev êriş û şehadet hemû jî ji ber vê yekê ne. Divê her kes vê rastiyê bibîne û qebûl bike. Eger ev rewş hîn bêhtir ji nedîtî ve bê û helwesta pêwîst neyê nîşandan, hingî weke gel em ê bikeve rewşeke hîn bi êş û nebaş. Eger helwesta pêwîst li dijî xiyanetê neyê nîşandan hingî wê xefika li ser xiyanetê hatiye avakirin bi cih bê. Kurdek nîne ku ev xefik çi ye. Ev xefik plana dewleta Tirk a ji bo qedandina Kurd û Kurdîtiyê ya bi komkujî û qirkirinê ye. Dewleta Tirk û desthilatdariya AKP-MHP’ê vê planê bi cih tînin. Polîtîkaya bingehîn a dewleta Tirk ma ne ev e? Eşkere ye ku ev e. Yên ku li wan tevdigerin jî hevkarên vê planê ne. Ev jî eşkere ye. Lewma em vê dibêjin; tevî ku tê dîtin ku têkiliya Barzaniyan a bi dewleta Tirk re hevkarî û xiyanet e, ev rewş bi şênberî nayê bilêvkirin û helwesta pêwîst nayê nîşandan. Heta vê demê ev yek teqez nehatiye kirin. Bi vî rengî pêşî lê hatiye girtin ku gel helwest û nerazîbûneke xurt li hemberî xiyanetê nîşan nede.

### Plana dewleta tirk dagirkirin û desteserkirına tevahıya başûrê kurdıstanê ye

Piştî ku Hakan Fîdan çû Iraqê û Başûrê Kurdistanê û hevdîtin kir, êriş zêde bûn. Bûyerên ku rojên dawî li herêma Bradostê diqewimin nîşan didin ku planên nû jî têne kirin û tê xwestin ku dewleta Iraqê jî tevlî vê yekê bê kirin. Li herêma Bradostê hewl tê dayin ku bikevin qadên gerîla, zext li gel tê kirin ku cih û warê xwe biterikîne. Eşkere ye ku ev yek amadekariyeke ji bo êrişê ye û parçeyek ji plana dagirkeriyê ya dewleta Tirk e. Ya ku li Kerkûkê tê kirin jî parçeyek ji vê planê ye. Berevajî îdîayên Barzaniyan ev hewldan ne ji bo rizgarkirina Kerkûkê ye, lê belê di berdêla wergirtina parek ji petrola Kerkûkê radestkirina ji dewleta Tirk re ye. Plana ku li ser Kerkûkê hatiye kirin planeke dewleta Tirk e. Ji ber vê yekê dewleta Tirk bi çend gotinên nerazî yên biçûk bûyerê dinixumîne. Naxwe dewleta Tirk xwedî nêzîkatiyeke welê nîne ku bixwaze Kerkûk weke parçeyek ji Kurdistanê pirsgirêkên wê bêne çareserkirin. Plana dewleta Tirk dagirkirin û desteserkirina temamiya Başûrê Kurdistanê ye.

### Em neçar in ji xiyanetê re bibêjin xiyanet

Êrişa li Hewlêrê li ser buroya KNK’ê hate kirin û di encamê de Nûnerê KNK’ê yê Başûr hevalê Denîz Cevdet Bulbun şehîd bû. Gelekî manîdar e ku êriş li dijî KNK’ê hatiye kirin. KNK ji bo pêkanîna yekîtiya neteweyî ya Kurdan di nava hewldaneke girîng de ye. Dema dawî di vê mijarê de karên gelekî girîng kiriye. Yek ji van jî û ya herî girîng di salvegera sedemîn a Peymana Lozanê de li bajarê Lozanê lidarxistina konferansê bû. Di vê konferansê de nîqaşên girîng hatin kirin, ji bo pêkanîna yekîtiya gelê Kurd biryarên girîng



hatin wergirtin. Peymana Lozanê tê wateya parçekirina Kurdistanê û destpêkirina pêvajoya înkar û îmhakirina gelê Kurd. Qirkirina Kurdan bi vê peymanê destpê kir. Di sala sedemîn a vê peymanê de li bajarên ku peyman hate mohrkirin pêkanîna karekî bi vî rengî, diyarkirina hêmanên bingehîn ên ku Peymana Lozanê ya qirkirin û dijminatiya li Kurdan xwe dispêrê û destnîşankirina îradeya avakirina yekîtiya Kurdan a li dijî vê yekê, gelekî girîng bû. Lê belê Barzanî tevlî vê civînê nebûn. Ji ber ku derd û armanceke Barzaniyan a ji bo yekîtiya Kurdan nîne. Berevajî vê yekê xwedî nêzîkatiyeke welê ne ku ji qirkirina Kurdan xwe xwedî dikin û dixwazin vê dewam bikin. Eger ne bi vî rengî bûya mîna me hemûyan dilê wan jî wê ji bo yekîtiya Kurdan lê bida, ji bo ev bibe mîna me hemûyan ew ê jî ji hewldanên bi vî rengî kêfxweş bibûya. Lê belê rewşa Barzaniyan ne bi vî rengî ye. Ne ku ji ber gotina me, lê belê kiryarên wan bi xwe nîşan didin bê ew çi ne. Yekane tişta ku em dibêjin ew e ku divê ev yek bê dîtin. Ne bi gotinên şermok lê belê bi rengekî xurt divê êdî her kes rastiyê destnîşan bike. Em neçar in ku ji xiyanetê re bibêjin xiyanet. Eger em karibin vê bikin, em karibin ji xiyanetê re bibêjin xiyanet e û helwestê li hember nîşan bidin, hingî em ê pêşî li ketin û felaketên mezin bigirin. Bi vî rengî em ê karibin yekîtiya Kurdan pêk bînin. Di rewşeke berevajî de wê rê ji felaket û xiyanetên hîn mezintir re bê dayin. Ev yek wê bibe nebaşiya herî mezin a li doza Kurd û Kurdistanê.

### ÊRIŞA LI SER BALAFIRGEHÊ JÎ BI ARMANCA BELAVBÛNA MÎT’Ê YA LI HERÊMA SORAN E

Têkildarî êrişa li Silêmaniyeyê jî em dixwazin vê yekê bibêjin. Li ser vê êrişê em hîn ne xwedî agahiyên berfireh û şênber in. Agahî tên ku êriş li ser balafirgehê hatiye kirin û di encamê de jî şehadet hene. Êrişên li ser Silêmaniyeyê ji bo çavtirsandina xelkê Silêmaniyeyê ye, ji bo belavbûna dewleta Tirk û MÎT’ê li herêma Soran e mîna li herêma Behdînanê, hewldanek ji bo tevlîkirina YNK’ê bi têkiliyeke hevkariya bi dewleta Tirk re ye mîna ku PDK dike. Ji ber ku xelkê welatparêz ê Silêmaniyeyê û herêma Soran heta niha dest ji helwesta xwe ya welatparêz berneda, êrişeke nû li dij hatiye kirin. Em van êrişên ku dewleta Tirk bi destê xayinan kiriye bi tundî şermezar dikin. Divê êdî her kes li hemberî xiyanetê helwesteke xurt û şênber nîşan bide. Dewleta Tirk siyaset û konsepta xwe ya qirkirina Kurdan dispêre xiyanetê û bi vî rengî dimeşîne. Yekane rêya rawestandina vê siyasetê û têkbirina vê konseptê pêşîgirtina li xiyanetê ye. Eger rêxistinên Kurd ên welatparêz, partî, rewşenbîr, nivîskar, hunermend li dijî xiyanetê helwesteke xurt û şênber nîşan bidin û gelê Kurdistanê helwesteke xurt destnîşan bike, hingî wê pêşî li xiyanetê hatibe girtin, hatibe bisînorkirin û bêbandorkirin. Em vê banga xwe careke din dikin, li welat û derveyî welat gelê me dakevin qadan, li dijî xiyanetê nerazîbûneke xurt nîşan bide, bang li partî, rêxistin, sazî û kesayetan jî dikin ku pêşengiyê ji vê yekê re bikin.”

# ‘Divê li ber zêdegaviyên Tirkiyeyê bê girtin’

**Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê diyar kir ku êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser herêmê têkoşîna li dijî terorê asteng dike. Rêveberiya Xweser ji bo rêgirtina li ber zêdegaviyên Tirkiyeyê jî bang kir.**

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têkildarî êrişên dewleta Tirk a dagirker daxuyaniyeke nivîskî weşand.

Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku di serî de dewleta Tirk a dagirker, hêzên dijber piştî di pêkanîna armanca xwe ya têkbirina îradeya gel de bi bin ketin, berê xwe dan hedefkirina herêmên bi balafirên bê mirov ên bi çek û hate gotin: “ Hin caran jî bi hincetên derew û bi rêya derxistina fitneyan, dixwazin yekitiya gelê me û pêkvejiyana wan ji hev bixin.”

Rêveberiya Xweser daxuyand ku armanca van hêzan ew e ku nakokiyên mezhebî pêş bixin û got:“Beşdarbûna Tirkiye û aliyên dîtir di bûyerên vê dawiyê yên li Dêrazorê rû dan de û bûyerên beriya vê yên li herêmên din qewimî bûn, îsbata vê yekê ye. Hêzên dijber armanc dikin ku pêngavên gelê me yê ji bo pêşxistina rêveberiya xwe asteng bike. Di heman demê de armanc dikin ku pêşî li têkoşîna domdar a hêzên me yên leşkerî û ewlehiyê ya li dijî terorê bigirin.”

Êrişên li ser rêya Amûdî-Qamişloyê, di heman rojê de li Şengalê erebe kirin hedef, beriya wê li Minbicê jî heman êriş pêk anîn. Di encamê de têkoşerên dijî terorê û tundrawiyê şehîd bûn. Ev hemû îsbat in ku Tirkiye dixwaze hincetan ji binkeftina xwe ya li herêmê re bibîn, nemaze ku armancên wê yên taybet ên li dijî herêmên me û li dijî projeya gelê me pêk nehatin.”

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê êrişên dewleta Tirk ên li dijî herêmê û gelê wê bi tundî şermezar kir û wiha pê de çû: “Di serî de hêzên dijî terorê yên bi hevkariya gelê me têkoşînê dikin, em bang li civaka navneteweyî dikin ku bikevin tevgerê û gavên cidî û aktîf biavêjin, divê rê li ber zêdegaviyên Tirkiyeyê bê girtin. Tirkiye bi êrişên xwe yên li ser herêmên me aşkera têkoşîna dijî terorê asteng dike. Em diyar dikin ku ev êrişên tirsonek me ji xeta têkoşînê û xebata ji bo pêkanîna hêvî û mafên gelê me dûr naxe, ji ber ku em hêz ji îrade û îsrara gelê xwe digirin. ”

Rêveberiya Xweser di dawiyê de ji malbatên şehîdan sersaxî û ji birîndaran re şîfaya lezgîn xwest.

# ‘Rêgezên neteweya demokratîk serkeftina li Dêrazorê bi dest xist’

Eşye Hiso destnîşan kir ku rêgezên neteweya demokratîk li hember komployên li dijî Dêrazorê, serkeftin pêk anîn. Her wiha diyar kir ku rizgarkirina herêmên dagirkirî, daxwaza gel e û erka her kesî ye.

Endama Nivîsgeha Têkiliyan a Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Eyşe Hiso rewşa li Dêrazorê bi “Cuda” wesifand û got: “Ji ber ku hêzên destwerdana Sûriyeyê kirin, xwestin ajandeyên xwe li herêmê ferz bikin. Ji ber wê, bi hev re kar kirin û alozî li Dêrazorê derxist. Ew li ser têla siyastê dilîzin. Vejandina DAIŞ`ê li herêmên Rêveberiya Xweser, ji berjewendiya wan e.”

Eyşe balkişand ser têkiliya xurt di navbera DAIŞ`ê û dewleta Tirk a dagirker de û got: “Hemwextî tunekirina DAIŞ`ê di aliyê erdnîgarî li herêmê de, dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe zêde kirin. Ji ber wê em destnîşan dikin ku dewleta Tirk xwedî li fikr û hebûna DAIŞ`ê derdikeve.”

Herwiha diyar kir ku hikumeta Şamê jî her tim hewl dide ku projeya Rêveberiya Xweser têk bibe û ji ber wê li hember siyasetên herêmî bêdeng ma, lê Eyşe da zanîn ku hevgirtina pêkhateyên Dêrazorê li hember êrişan ku fitne derxistiye, planên wan aliyan têk bir.

**Rêgezên neteweya demokratîk rê li pêşiya serkeftinê vekir**

Eyşe destnîşan kir ku hevgirtina êlan li Dêrazorê û piştgiriya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji wan re li hember aliyên fitne li bajêr derxistiye, bersiva herî guncew bû.

Eyşe wiha pê de çû: “Peyama hatiye dayîn; em nahêlin tu alî destwerdana herêmên me bike û em ê destê wan qut bikin.”

Girêdayî berdewamiya êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li dijî herêmê Eyşe got: “Dewleta Tirk bi topbarankirina gundên Minbic, Til Temir û hedefgirtina sivîlan, bersiv da binkeftina planên xwe li Dêrazorê. Dewleta Tirk ji wan êrişan armanc kir, herêmên din ên Sûriyeyê dagir bike.”

Der barê sedemên yekser ên bidestxistina serkeftinê li Dêrazorê Eyşe Hiso got: “Bingeha serkeftinê, yekîtiya pêkhateyan, berxwedana xurt a şervanan li hember wan êrişan e. Wan şervanan, soz dane ku axa Sûriyeyê ji tevahî xetereyan biparêzin. Nîştimanî û parastina welêt, vebijarka êlên herêmê bû.”

Eyşe anî ziman ku rêgezên neteweya demokratîk ên li ser bingeha biratiya gelan û jiyana hevbeş, hevgirtina pêkhateyan û serkeftin li Dêrazorê pêk anî û diyar kir ku xwedîderketina li Rêveberiya Xweser û hêzên leşkerî komployên hêzên komploger vale derxist.

Eyşe diyar kir ku tevahî beşên civakê di nav de êl, qebîle û rûspî careke din daxwaz ji QSD`ê kir ku herêmên dagirkirî rizgar bike û xelkê wê yê resen lê vegerîne û got: “Ev erka QSD`ê ye.”

**`Em ê çawa diyalogê bikin madem herêmên me hîna dagirkirî ne`**

Eyşe anî ziman ku berdewamiya dagirkirina axa Sûriyeyê ji aliyê dewleta Tirk ve, encama siyasetên şaş ên hikumeta Şamê li dijî gel in ji ber ku hişt dewelat Tirk destwerdanê bike û wiha berdewam kir: “Rizgarkirina herêman, bi destê gel



de ye. Li hember vê vînê, dewleta Tirk a dagirker, dixwaze peymana Edeneyê nû bike. Rihet nasekine heta ku Heleb, Musil û Kerkûkê dagir bike ji ber ku dibêje ev bajar li gor Mîsaqê Millî yên wê ne.

Li gor Eyşe madem gelek herêmên Sûriyeyê hîna dagirkirî ne, tu wateya diyalogê ji bo bidawîkirina aloziyê tune ye.

Eyşe di wê baweriyê de ye ku QSD`ê hêza yekane ye ku ji bo rizgarkirina herêmên dagirkirî kar û xebat dike û got: “QSD`ê dê serkeftinên din li erdnîgariya dagirkirî pêk bîne. Divê baweriya me bi hêza me mezin be ku mirovahî ji DAIŞ`ê xilas kir û bi saya fedakariyên ku dane bû sembola têkoşînê.”



## Xetimîne îcar dixwazin bi xiyanetê pişta kurdan bişkînin!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirk ev demek dirêje li dijî Herêmên Parastinê Yên Medya li Başûrê Kurdistanê êrişên berfireh pêk tîne. Tevî hemû cûreyên çekên pêşketî yên NATO’yê di dest de ye, hêza PDK’ê di xizmetê de ye û gelek ajanan dixe dewrê li hember gerîlayên serdemê nikare herêmê dagir bike. Berûvajî wê gerîla derbeyên giran li dagirkeran dixin û hema bêje roj derbas nabe ku nûçeyên çalakiyên gerîla li ser saziyên ragihandinê nayê weşandin.

Di heman demê de û bi heman konsptê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwestin bi îdaya şerê navxweyî siyasetên xwe li herêmê pêk bînin û ji Dêrazorê destpê kirin, şaneyên DAIŞ’ê, çeteyên hikûmeta Şamê û çeteyên Dewleta Tirk bûn yek, lê car de çawa li herêmên Parastinê yên Medya serneketin, li Dêrazrê jî hêzên QSD’ê bi hoz û eşîrên herêmê re plan vala derxistin. Berûvajî wê gelê herêmê piştgiriya xwe ya bi QSD’ê re hîn zêdetir kir. Berûvajî wê em dinerin di aliyê dîplomasî de gavên hîn mestir têne avêtin. Di rojên pêş de jî wê encamên wê hîn zêdetir diyar bikin.

Li Bakurê Kurdistanê jî gelê kurd bi hemû hêza xwe berxwedanek bê hempa nîşan dide û tevî zulim û zordariyên herî mezin, qirkirina siyasî û girtinan gelê Bakur nikarin siyaset û ejindeyên xwe li ser gelê kurd feriz bikin. Berûvajî wê tekoşîna gelê kurd hîn mezin û firehtir dibe.

Li Rojhilatê Kurdistanê jî me dît di salvager serhildana “JIN, JIYAN, AZADÎ” de çalakî û xwepêşandanên berfireh û berdewam li seranserî Rojhilat û Îranê hatin lidarxistin. Herî çendî rêjîma Îranê û hevkara dewleta Tirk a civînên Astanayê dixwaze dawî li tevgera gel bîne, lê li wir jî agirê bi pîzota Jina Ciwan a Kurd Jîna Emînî destpê kir, her ku diçe gûrtir dibe.

Li Derveyî welat jî bi çalakî û tevgera xwe gavan ber bi vekirina kenalên dîplomasî ya di çarçoveya her çar aliyên welat davêtin. Ev di konfrans û çalakiyên têne lidarxistin û beşdarbûna biyaniyan diyar dibe.

Ev gavên behsa mijarê ne li xweşiya dewleta Tirk û dijminên gelê kurd yên din tên, ji ber wê jî êrişên xwe yên heyî çend qat zêdetir kirine. Êrişên li Şengal, Hewlêr, Silêmanî, Qamişlo, Minbic û deverên din ku bi balafirên bê mirov û bi êrişan pêk hatin, di çarçoveya zêdekirina êrişên li dijî Tevgera Azadiyê û gelê kurd pêk hatine.

Di encama êrişan de komeke din pêşeng û şoreşgerên kurdan şehîd û birîndar bûn. Lê heger kesên li ser erdê agahî parvenekiribana, wê dewleta Tirk nikarîba êriş pêk baniya. Ez li vir behsa him êrişên bi balafirên bê mirov û him êrişên din dikim.

Yenî wer xuyaye şebekeyên xayînan baş di nav me de bi cih dikin. Ji bo wê jî û ji bo parastina destkeftiyên gelê kurd li her derê divê em êdî bi pisporî şerê xayînan bikin. Ew xayîn partîbin, kom bin, kes bin, çi dibin bela bibin. Êdî erka her kurdekiye li dijî van xayînan bikeve tevgerê û bi hemû hêza xwe di aşkerekirin û tazîkirina planên wan û dijminan de tevbigere.

# Ji Qirêjiya Mala Barzanî çend dilop

**Volqan Elî**

Dîrok, 1946. Di encama şert û mercên konjûktûrel de bi pêşengiya Qazî Mihemmed li Mihabadê, Komara Demokratîk a Kurdistanê tê avakirin. Werhasil, banî Mele Mistefa dikin û wî dikin berpirsiyarê giştî yê leşkerî. Di demeke kurt de gava ku Rûsyaya Sowyet û Îran li hev dikin, artêşa sor a Rûsya xwe dikişîne. Qaşo Barzanî, ji karûbarê leşkerî berpirsiyar bû. diviyabû li dijî artêşa Îranê serkêşiya berxwedanê bikira. Lê ew çi dike? Dest ji Komara Kurdistanê berdide, bi çend sed zilam û xizmetçiyên xwe ve dibe penaber. Di encam de artêşa Îranê Komarê hildiweşîne, Pêşawa Qazî Mihemmed û pêşengên din ên Komarê li sêdarê dide. Ti berjewendiyên gelê Kurd di vê bûyerê de xuya nakin.

Heman Malbata Malûm, di tasfiyekirina hêzên din ên Rojhilatê Kurdistanê de jî bi roleke diyarker rabûye. Silêman Maûnî, kurê herî mezin ê Mihammed Emîn Maûnî ku wezareta hindirîn a Komara Demokratîk ya Mihabadê bûye. Silêman û çend hevalên wî yên din, dixwazin li dijî Îranê dest bi têkoşînê bikin. Lê PDK’ya Mele Barzanî, ji ber peymana di navbera xwe û Îranê de vê qebûl nake. Maûnî, Mele Aware û çend pêşengên şoreşger jê diqetin. Bi komployên cuda cuda van pêşengan qetl dike û laşê wan teslîmî dewleta Îranê dike.

**Mala Barzanî, ne tenê ji bo Rojhilat, ji bo tevgera şoreşgerî ya Bakur jî bûye melkemot.**

Di dîroka 11’ê Tîrmeha 1965’an de bi pêşengtiya Feîq Bucak û rewşenbîrên cuda T-PDK tê avakirin. Serokê vê partiyê bi xwe, Mele Barzanî ji rewşê agahdar dike. Mele jî agahî dide MÎT’ê (neviyên wî çawa jî dane li ser şopa wî). MÎT bi komployekê Feîq Bucak îmha dike. Paşê Seît Elçî û Dr. Şivan(Seît Kırmızıtoprak) li ser navê T-PDK ji bo ku li Bakur dest bi şerê gerîla bikin, diçin cem PDK. Lê çawa ku di navbera Mele û Îranê de peymanek hebû, divê şoreşgerên Rojhilat werin tasfiyekirin, her wisa di navbera Malbata Barzanî û dewleta Tirk de jî peymanek hebû: Diviyabû dijminên dewleta Tirk bihatan tasfiyekirin. Piştî bi salan, Îdrîs Barzanî vê rastiyê ji kesekî rayedar ê T-PDK re dibêje. Li gorî vê, Seît Elçî û Dr. Şivan ji aliyê Mala Barzanî ve li ser esasê soza xwe ya di navbera dewleta Tirk de bi komployên cuda tên kuştin. Li gel wan, çend kesên din jî tên îmhakirin. PDK’ya Mala Barzanî ne tenê, hêzên ji derveyê xwe, ji bo xwe jî, dema ku berjewendiyên dagirkeran dibe mijar, gelek caran xiyanet kiriye. 1975’an hejmara pêşmergeyan digihêje bi sedhezaran. Hêzên dagirker vê xetereyê dibînin. Li Cezayirê peymanekê girêdidin. Di encamê de PDK bi berxwedanê nafikire. Aş Betal îlan dike. Şorêşê terhîs dike. Gelek pêşmerge xwe di kendalan de wer dikin.

Herî dawî, sala 1992 li dijî gerîlayên PKK’ê şer îlan dike. Piştî vê hin caran



şerê xiyanetê disekine û hin caran jî geş dibe. Lê ti car heta heta bi dawî nabe.

Sala 2020, dagirkeriya Tirk li ser Heftanînê tevgera dagirkeriyê dide destpêkirin. Ji beriya wê jî heye lê bi vê re, helwesta Malbata Barzanî dest pê dike aşkere bibe. Piştî vê dîrokê hemû derfetên xwe dixe bin xizmeta dagirkeriya Tirk. Leşkerên Tirk, baregehên PDK wekî cihê xwe bi kar tînin. Di van sê salên dawî de dagirkeriya Tirk, hem ji aliyê bakur ve û hem jî ji aliyê başur ve bi tang, top û balafirên xwe ji baregehên xwe yên li vê derê û ji baregehên PDK êrîşê gerîla dike. Ruxmî her tiştî dagirkeriya Tirk li Zap, Metîna û Avaşînê xetimî. Lê hema di cih de Mala Barzanî ket tevgerê. Par li herêmên di navbera Zap, Metîna û Gareyê de ji bo ku hêzên dagirker bi rehetî xwe bigihînin çeperên gerîla dest bi çêkirina rêyan kir.

Herî dawî jî, li herêma Xakûrkê ew bi xwe, derket operasyona herêma Bradostê. Ne weke berê, leşkerên Tirk cilên wan li xwe kirin yan jî wan cilên dagirkeriyê xistin berxwe… rasterast ew bi xwe bûn.

Dîsa di salvegera 12 Îlona 1980’an de bi 200 seyareyên tije tang, top û leşker êrîşê Berbizinê kirin. Li gorî nûçeyên herêmî şerê dagirkeriya Mala Barzanî demeke dirêj berdewam kiriye. Ev, dibe ku ji qirêjiya Mala Barzanî çend çend dilop bin. Eger em dîsa li serî vegerin ne em dikarin ji nav derkevin ne jî pirtûk têrê dikin. Tenê em bi mînakeke balkêş dawî lê bînin. Sal: 1977. Cih: Dîlok. Ji pêşengên gruba îdeolojîk a Apoçiyan, Haki Karer ji aliyê komeke ajan-provokator ku girêdayî bi MÎT û PDK’ya Mala Barzanî ve ye (Stêrka sor) tê qetlkirin.



# PYD’ê partiya siberojê û yekrêziya kurdî ye

Hevserokê PYD’ê Salih Muslim destnîşan kir ku: Heta gel were rêxistinkirin û heta statuya xwe bistîne wê tekoşîn berdewam be. Di siberojê de dibe ku erkê ku dikeve ser milê PYD’ê girantir bibin. Dibe ku gelek astangî derkevin holê, lê ji bona gihiştina serkeftinê wê tu tişt ji bona me nebe asteng.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Salih Mislim diyar kir ku: Ji beriya ku PYD’ê were damezrandin, avakirina partiyek siyasî ji kemaliyetan bû, ji ber ku siyaset ne mîna karekî sereke dihate dîtin. Angu partî û kesayetên siyasî ne li gorî giraniya siyasetê tevdigeriyan. Lê PYD’ê wisa li karê siyasî meyze nedikir, wekî çawa giranî ji av û nan re dihate dayîn ji karê siyasî re jî dihate dayîn. Armanc ji vê gavê jî avakirina civakeke siyasî, exalqî û amedekarkirina kadroyên ku pêşengtiya civakê bikin. Ji bo wê jî pêwîstî bi kar, fedekarî û berdêldayînê heye û gerek hin hebin ku karibin berdêl bidin.

‘PYD’ê bi xebata xwe baweriya gelê kurd qezenc kir‘

Salih Mislim diyar kir ku partiyên kurdî yên kilasîkî wiha nêz nedibûn, li gorî valatiyên xwe hefteyê carekê dihatin gel hev û mijar nîqaş dikirin û bi awayekî sîstematîk avakirina bername û pirojeyên çareseriyê yên siyasî pêşkêş nedikirin. PYD’ê ji destpêkê ve û bi riya kar û xebatên xwe nêrîna li ser partiyên siyasî şikand. Kar û xebata siyasî, rêxistinî û bîrdozî di nava gel de bi rêk û pêk da meşandin.

Di mijara berxwedanê de jî, partiyên berê dema zextek li ser wan dihat, xwe ji kar û xebata siyasî û rêxistinî dûr dixistin. Di serhildana Qamişlo ya 12’ê Adara 2004an û li seranserî Rojava berxwedan û sekna gel li hemberî êrişên rejîma baas encama kar û xebata bi rêxistinî ya ku di nava gel de hatiye meşandin bû.

Salih Mislim destnîşan kir ku wê demê komên wan hatin girtin û liberxwedan û her çiqasî bi dehan şehîd jî çêbûn lê gelê Kurd gav bi şûn ve neavêt. Di wê demê de partiyên siyasî ji rêjîma Sûriyê re gotin “Çima hûn me digrin, yên ku van karan dikin PYD’e ye.” Lê di rastiyê de PYD’ê her tim ji bona belavkirina rihê berxwedanê di nava gelê Kurd de pêşengî dike.

‘Partiya xwedî dispilîn û rêxistin serkeftinê misoger dike’

Salih Mislim girêdayî guhertina sêyemîn a di warê displînê di nava PYD’ê de anî ziman û got ku. PYD’ê heta niha deh kongir lidarxistine, ji bilî konfiransên ku hatine damezrandin. Kar û xebata ku PYD’ê daye meşandin rastiya dispilînê û girêdana bi armancê ve destnîşan dide. Rêxistinbûyîna partiyê bingehê karê siyasî ye, ev yek jî di nava gel û alîgirên şoreş û partiyê de hatiye çandin.

Salih Mislim girêdayî mijara perwerdeyên di nava PYD’ê de nirxand û destnîşankir ku gelek dewreyên perwedeyê ji endam û dostên partiyê re hatine vekirin. Armanc ji van perwerdeyan avakirina kesayet û civakeke siyasî û axlaqî û azad e. Ji ber ku PYD’ê li kûderê be civaka xwe tenzîm, rêxistin û perwerde dike. Perwerdeya ku di nava gel de tê meşandin, ji aliyê hişmendî, siyasî û exalqî ve jî bandoreke mezin li ser tevahî civakê daye avakirin.

Di guhertin û avakirina hişmeniyê de PYD’ê bi roleke sereke rabû û bi taybet jî di nava PYD’ê de jin bi erkê xwe yê bingehîn rabû û rêxsitna xwe avakir û Kongreya Star ji wir destpê kir û hîn jî ew xebat berdewam e. Herweha Sistema hevserokatiyê destpêkê di nava PYD’ê de destpê kir û niha bûye sîstemeke bingehîn li herêmê bi giştî re.

‘PYD’ê di avakirina komîn, meclis û saziyan de xwedî rokele sereke bû’

Salih Mislim diyar kir ku bandora PYD’ê li ser Rojava gelek mezin e. Dema partiyek siyasî bêyî desthildartiyê bixwaze pêşengtiyê ji gel re bike, ev gaveke mezin e û ev yek bi zanebûn jî hate kirin. Heta niha çi karê li Rojava hatiye kirin PYD’ê serkêşî jê re kiriye. Meclîsên herêmî û meclîsên gel ji salên 2008’an û 2007’an ve ji aliyê PYD’ê ve hatin avakirin û tevî zilim û zordariya ku ji milê rejîma baas ev dihate meşandin jî, lê kar û xebat dihate meşandin.

Salih Mislim anî ziman ku gelek partî di salên 2003’an û heta 2004’an de cesaret nedikirin ku cejna Newrozê pîroz bikin, lê PYD’ê serkêşiya gel kir û Newroz li 12 herêman bi şahiyên mezin pîrozkir.

Salih Mislim destnîşan kir ku di destpêka şoreşa Rojava û Sûriyê de jî, PYD’ê di warê pêşengtiyê de xwedî erkekî serekebû û PYD’ê di avakirina TEV-DEM’ê de bi roleke bingehîn rabû. Rêveberiya Xweser jî bi pêşengtiya PYD’ê hate avakirin. Meclîs, komîn û saziyên ku hatine avakirin jî, PYD’ê di avakirina wan de ji milê bîrdozî, rêxistinî û hişmendî de jî xwedî roleke giring bû.

‘PYD’ê ji bona hevrêziya Kurdî jî her tim di nava kar û xebatê de ye’

Salih Mislim ji bona yekrêziya Kurdî jî got ku: PYD’ê ji destpêkê ve û di milê hişmendî û bîrdozî ve, ne mîna partiyên Kurdistanî yên din dihizire. Her dem di nava hewldanan de ye ku bi partiyên Kurdî yên mîna PDK û YNK’ê jî di nava têkiliyan de be. Herweha di xebatên Kongreya Netewî de cihê xwe di nava hemû komcivîn û xebatan de û bi rengekî çalak girtiye. Di xebatên dîplomasî yên li ser asta Kurdistanê



û girêdayî xebatên dîplomasiya civakî ya li Ewropa tê meşandin û bûroyên ku li wir hatine vekirin, PYD’ê cihê xwe di nava van kar û xebatan de jî girtiye. Raste bi riya nûnertiyên Rêveberiya Xweser ev kar tê meşandin, lê ji destpêkê ve ev kar û xebat bi riya PYD’ê hatin tenzîm kirin. Ev di kongreya Lozanê û xebatên din yên ku hatine meşandin de jî, PYD’ê di nav de cihê xwe girtiye û bi rengekî aktîf tevlîbûna xwe jêre daye çêkirin.

Salih Mislim di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser tekoşîn û xebata bi salên dirêj ya partiya PYD’ê û bedelên giran buha yên ku ji bona vê tekoşîna azadiyê hatine dayîn. Di serî de şehîdên ku partî avakirin û di asta pêşengtiyê de cihê xwe girtin, mîna rêveberiya partiyê şehîd (Şîlan Kobanê) û hevrêyên wê (Cemîl, Zekeriya, Ciwan , Fûad) û bi sedan şehîdên ku tovê partiyê avêtin û pêşengtî di hemû warî de kirin. Herweha û ji bona xwedî derketin li doza şehîdan û pêkanîna erkên ku dikevin ser milê me, mîna partiya PYD’ê pêwîste ku em ji bona pêkanîna sîstema Netewa Demokratîk, konfidralîzma demukratîk kar û xebatê bidin meşandin û remanê Rêber Apo di nava civakê de belav bikin û civaka xwe perwerde bikin û her tim di asta pêşengtiyê de û ji bona serkeftinê bê navber di nava kar û xebatê de bin.

## Pêwîste yên dibêjin Tirkiye me guhdar nake bên naskirin

**Zekî Bedran**



Dewleta Tirk li Sûriyê êrişan berdewam dike. Di salvegera êrişa DAIŞ’ê ya li ser Kobanê de, 15’ê Îlonê li Minbicê wesayîta fermandar û şervanên YPJ’ê kir hedef. Sê jinên şoreşger şehîd bûn. Van mirovên binirx ku jiyana xwe fedayî azadiyê kirine û ji derveyî xizmeta gel tu armanca wan tune ye, ji bo armancên xwe yên dermirovî û nîjadperest qetil dike. Dewleta Tirk a serberela, tu zagon û mirovahiyê nas nake, weke qatilekî berdane holê.

Dewleta Tirk nikare van qetilkirinan bê erêkirin û piştgiriya Rûsya û DYE yê bike. Ji ber ku qada hewayî di navbera DYE û Rûsyayê de parvekiriye. Artêşa Tirk nikare bi hêsanî di bejahî re êriş bike. Dê bersivê bigire û windahiyên wê zêde bibin. Lê hêza parastina hewayî ya QSD’ê tune ye. Ji ber wê jî bê ku windahiyan bide, bi serweriya teknîkê şoreşger û welatparêzan qetil dike. Minbic herêmeke di bin venêrîna Rûsyayê de ye. Li Rojava xeta rojhilat a Eyn Îsayê di berpirsyariya DYE yê de ye, xeta rojava jî di berpirsyariya Rûsyayê de ye. Dibe ku Rûsya dewleta Tirk nexe herêmê. Dema dewleta Tirk zagonan derbas bike dikare SÎHA’yê wî daxe. Ji ber wê jî hêz û pozîsyona dewleta Tirk a şer derbixe tune ye. Ji ber ku qada hewayî ya dewleteke din binpê dike, ne li ser axa xwe ye. Eger yekdu SÎHA yan jî ÎHA bên xistin, careke din nikare bikeve herêmê.

Rûsyayê dema bi QSD’ê re li hev kir û hate herêmê, gotibû dê li Qamişlo ji bo parastina hewayî radaran dane. Alîkarî ji QSD’ê xwest. Her cûr alîkarî hat dayîn. Lê Rûsyayê di pratîkê de tiştek nekir. Dema berpirsyariyên wan tînin bîra wan dibêjin “Tirkiye me guhdar nake” û bi vî awayî xwe diparêz in. Karbidestên DYE’yê jî heman tiştan dibêjin. Dibêjin “Êrişên Tirkiyê istiqrara herêmê xirab dikin, têkoşîna li dijî DAIŞ’ê nerênî bandor dike. Em ne alîgirên êrişan in. Em dibêjin lê me guhdar nakin.” Du hêzên mezin ên cîhanê dibêjin “Ma em çi bikin, Tirkiye me guhdar nake” û bi vî awayî xwe diparêz in. Çi mafê dewleta Tirk li Sûriyê heye? Heman demê de qadek berfireh dagir kiriye, sûcê paqijkirina nîjadî dike. Divê niha ji ber sûcên mirovî û sûcên şer ên kirine bihatiba darizandin. DYE û Rûsya ji ber berjewendiyên xwe çavê xwe ji van sûcan re digire û hevkariyê dikin. Dijminahî û êrişkariya dewleta Tirk a li hemberî Kurdan ranaweste. DYE, NATO û Rûsya kaxeza Kurdan bikar tînin û hewl didin dewleta Tirk li gorî armancên xwe bikar bînin. Yên ku Tirkiyê jî rêve dibin ji bo tunekirina Kurdan heta dawî xwe didin bikaranîn. Her cûr tawîzê didin. Jixwe Tirkiyê pêşkêş dikin, dikeve nava her sûcî, gef û şantajê bikar tînin.

Îsveç û Fîlandiyayê ji bo endamtiya NATO’yê serlêdan kir. Ji ber ku Tirkiye endamê NATO’yê ye divê weke welatên din erê bikira. Hema rewş ji bo xwe bikar anî. Got, li dijî YPG û Kurdan helwest nîşan bidin, ambargoya çekan a li ser min rakin. Çi têkiliya Kurdan bi Îsveç û Fîlandiya heye? Gelo van dewletan ji bo bibin endamên NATO’yê bi Kurdan şêwirîn, gelo destûr xwestin? Tu têkiliya Kurdan bi serlêdana van dewletan re tune bû. Ji bo vê jî pêwîst bû NATO û dewletên eleqeder, di vê mijarê de li ser Kurdan bazarkirin red bikirina. Lê wisa nekirin. Ji bo berjewendiyên xwe Kurd kirin qurban. Heman tiştên di sala 1923’an de di Peymana Lozanê de kirin. Erdoganê faşîst niha hewl dide Îsveç û welatên Ewropa li gorî xwe bixe tevgerê.

DYE’ê tenê bi hevkariya Bakur û Rojhilatê Sûriyê dikare li Sûriyê bimîne. Eger SDG nebûya nedikarî li dijî DAIŞ’ê şer bike. Niha jî operasyon3en hevkar tên kirin. QSD pasbantiya bi dehhezaran girtiyên DAIŞ’ê dike. Ji bo vê DAIŞ’ê êrişî Hesekê kir. QSD’ê 120 windahî dan. Bi vê re jî beregehenên leşkerên DYE’yê yên li herêmê dikin. Heta niha di van beragehan de leşkerek ê DYE yê birînda jî nebûye. QSD li gorî hevkarî û hevçekiyê nêz dibe. Lê DYE li gorî van pîvanan nêz nabe. Yên bi wan re li dijî DAIŞ’ê şer dike, beşdarî operasyonan dibe, wan diparêz e, dewleta Tirk tê bi SÎHA’yan li QSD’ê dixe, DYE jî temaşe dike. Û weke henekekî dibêjin “Karbidestên Tirkiyê me guhdar nakin”. DYE bi milyon dolaran dirijîne Ukraynayê. Çekên herî pêşketî dide. Hêzeke weke Rûsyayê dide pêşberî xwe. Lê li hemberî karbidestên Tirk ên hevkarê wî qetil dike, şervan, zarok û jinan qetil dike bêçare ye!

Rewşa Rûsyayê jî heman e. Ji herkesî baştir dizane ku dewleta Tirk dixwaze li Sûriyê çi bike û dagir kiriye. Pûtîn, ji bo Ukrayna nebe endamê NATO’yê ev şer derxist. Bû sedemên windahiyên mezin ên can û mal. Lê dema dostê wî Erdogan dibêje “Ukrayna maf dike bikeve NATO’yê”, Pûtîn karî çi bike!



## Şahidiya Apê Mûsa

**Farûk Sakik**

Musa Anter, di 20’ê Îlona 1992’yan de li Amedê ji aliyê kontrayên dewletê ve hat qetilkirin.

Çima Musa Anter hedef hatibû girtin? Bersiv di jiyana wî de bû. Jiyana wî ya 74 sal a ku bi têkoşîna doza Kurdistanê derbas bûbû. Ev têkoşîna wî bala dijminên Kurdan jî kişandibû û ji bo vê yekê Apê Mûsa wek hedef hatibû destnîşankirin.

Musa Anter di pirtûka xwe ya bi navê “Hatiralarim” de wiha dibêje:”Ez şahidê zindî û sondxwarî yê tengasiyên Tirkiyê yên 55 sala me. Gelo ez tenê şahid im? Na! Ez her wiha mehkûm, bersûc û dozdarê Tirkiyê me. “

Musa Anter ji çi re şahidî kiribû? Kemalîstên ku di dema perçebûna Împaratoriya Osmanî de bi navê biratiya olî piştgirî ji Kurdan xwestin, diyar kirin ku dewleta ku were avakirin wê bibe dewleta hevpar a Tirk û Kurdan. Diyar kirin ku ew li Lozanê nûnertiya Tirk û Kurdan dikin, lê piştî îmzekirina Peymana Lozanê yekser hemû gotinên xwe ji bîr kirin.

Dema di 29’ê Cotmeha 1923’yan da komar ragihandin û bi daxuyaniya Komarê re red û înkara li hemberî gelê kurd rewa û fermî kirin. Komara Tirkiyê li ser bingeheke nijadperestî, li ser bingehê Tirkbûnê û înkara Kurdan hat avakirin.

Di Destûra 1924’an da têgîneke hemwelatîbûnê ku hebûn, ziman û çanda gelê Kurd înkar dike û her kesên li Tirkiyê rûdinên weke Tirk dihesibîne, hat bicihkirin.

“Takrîr-î Sikûn” a di sala 1925’an û piştre bi ‘Plana Îslahatê ya Rojhilat” li Kurdistan pêvajoya red-îmha û asîmîlasyonê dest pê kir.

Zimanê Kurdî bi fermî qedexe kirin, ji xwe re kir armanc ku li Kurdistanê Kurdan tune bike, ji bo ku bigihêje vê armancê qetlîamên girseyî pêk anîn. Rejîma Kemalîst di sala 1921’ê da li Koçgirî, di sala 1925’an de li herêma şerê Şêx Seîd, di sala 1928-30’yan de li Agirî, li Zîlan û di sala 1938’an de li Dêrsimê, bi her cure rê û rêbazan û bi komkujiyan serîhildan û berxwedana gelê Kurd a ji bo azadiya neteweyî tepeser kirin.

Siyaseta qirkirina çandî ya ku sed sal dom kir, li dijî ziman û çanda Kurdî meşandin.

Apê Musa di 55 salan de ji van yekan re şahidî kiribû. Li dadgehê dixwest van kiryarên dewleta Tirk bîne ziman. Ji bo vê yekê jî hedef hatibû girtin û di 20’ê Îlona 1992’yan de şehîd ketibû. Bi Apê Musa jî sînorkirî neman êrişî şagirtin wî jî kirin. Gelek rojnamevan hatin kuştin.

Dema Apê Musa şehîd bû, tevgerek bi navê PKK’ê derketibû û ji bo van kiryarên dewleta Tirk ku li dijî Kurd û Kurdistan pêk anîbûn berterafbikin têdikoşiyan. Li aliyek jî mîrateya Mûsa Anter derdiketin.

Mîrasa wî hebû. Baweriyên wî hebûn. Bi vê tevgerê bawerî anîbû. Apê Musa, Rêber Apo di sala 1970’yî de li Stenbolê di civînek DDKO de dîtibû. Lê bi esasê xwe ew ji berê de naskiribû û bi wî bawerî anîbû. Serhat Bûcak, di hevpeyvînek xwe de digot; ewroj ez jî li wê derê bûm, Apê Mûsa ji kesên digotin tu çima nasnameya Abdullah Ocalan vedişêrî? Gotibû divê ev kes were parastin.

Ew kes hem xwe û hem jî gelek parast. Bi têkoşîna wî re destkeftiyên Kurdan çêbûn. Lê di parastina wî de hin kêmasî çêbûn ku bi komployeke navnetewî dîl hat girtin.

Apê Musa çawa Rêber Apo ji bo nebe hedef parastibû, divê Kurd ji bo azadiya wî seferber bibin da ku mîrasa Apê Musa pêk were.